Wergêr di ziman û edebên neteweyî de

Hecî Cefer

Divêt wergêr di meydana wergêranê de hunermend be paşî şarezayî û zewq li ser wergêrana têkista ji zimanekî bo zimanekî din hebe.
Bi van her du xalan wergerandin dê xizmeta ziman û edebê neteweyî bike. Xwe heger ev her du xal li cem wergêrî peyda nebûn, bi zehemet wergêrana wî bikaribe rolekî pozetîf di meydana ziman û edebî de bibîne.
Ji bilî hindê ku wergerandin ji zimanekî bo zimanekî din, hizir û bîra, rewşenbîriyê, kulturê miletan li hev diguhere, bi kare dewlemendkirin û pêşvebirina zimanî jî radibe. Bo nimûne, ew têkista ji zimanekî biyanî bo ser zimanê kurdî dihête wergerandin dibe egerê hindê ku zimanê kurdî ji layê ferhengî ve dewlemend bibe. Çunkî wergêr hemî gava peyvên nû, ristên nû û taze peyda dike û dihavêje ser samanê zimanî. Her wesa zimanê têkist bo dihête wergerandin ji layê rewanbêjiyê ve dewlemend dibe û ciwan û xweşik dibe, çunkî wergêr bi karê hunerî di nav zimanî de radibe.
Wergêrandin dînemoyeke yan hêzeke neteweyî ye hemû gava zimanî pêşve dibe, dilivîne, dihejîne, nahêle ziman rawetse, her tim û tim nûjen dike, peyvên nû, ristên nû û bi hêz û şêwazên nû û rewanbêjiya nû dixe nav ferhenga zimanî. Bi kurtî ziman bi wergeranê dixemile û nûjen dibe.
Eve ji layê zimanî ve, ji layê edebî ve jî, her têkisteka edebî bihête wergêran bo ser zimanê kurdî bo nimûne bi hizira min, ew têkist dibe milkê zimanên nû, yan jî her çi nebe, her du ziman hevpişkin di vê têkistê de, çi roman be yan çîroka dirêj be, yan jî helbest be…htd.
Ji layekî dî ve, helbestvan yan nivîser gelek sûd û qazancê ji hizira wergêrayî dibîne û mejiyê wî pê avadan dibe.
Hizirên nû, wênên nû, şêwazên nû, ramanên nû, di serî de peyda dibin. Paşî van hizir û wêneyan di nav baxçeyê edebên netweyî de diçîn û dixemelîn.
Çend bizava wergerana bi hêz be ewqas jî ziman û edebên netweyî pêş dikeve. Berûvajî jî, ya diruste çend wergêran ya lawaz be, ewqasî ziman û edeb bê hêz û lawaz dibe.
Bi hizira min heger her miletekî zimanek û edebekî lawaz hebe, dikare bi rêka wergêranê ziman û edebê xwe dewlemend bike, heta radeyekî wesan ku hest bi hejarî û lawaziya ziman û edebê xwe neke.